

Bo bîranîna Şiyar Farqînî(1953 Farqîn – 2003 Stockholm)

Kakşar Oremar

Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Roja 21ê Aprilê li Newwroz TV bernama „Ewrebaş Kurdistan“ ku ji hêla hunermendê hêja Necmedîn Xûlamî ve hate pêşkêşkirin, li ser bîranîna hunermendê nemir Şiyar Farqînî bû. Bi pêwîst dizanim ku dest xweşiya hemû xebatkarên Newroz.TV bikem ku îro dîsa weke TVyeke netewî nirxekî me Kurda anku hunermend Şiyar Farqînî bi bîr anînin.



Şiyar Farqînî xwdî dengê nerm bû ku li ser hissên mirova bi bandore, yanî guhê mirova naêşîne. Herkes xwedî dengê, lê herkes nikare dengê xwe durist bikar bîne. Şiyar Farqînî hem lawika xweş dibêje û hem jî stranên bi ritmîk. Mesela dema mirov li strana wî ya bi navê „Werî Bêmal“ guhdar dike, xerîbîyeke ecayîb di dengê wî da hiss dike. Ew li ser dengê xwe hakime û dengê wî jî tam dengê Kurdî ye û qirka wî neketiye ber bayê asîmîlasyona Kemalîstên înkarger. Yanî mirovên ku ji Farqînî ne, piranî hem Kurdên başin û he jî dema hunermendên wira strana dibêjin, baş mafê stranê didinê.

Şivan û Gulistan Perwer, Şiyar Farqînî, Dilgeş, Xebat, Zozan, Birader Musikî, Eyşe Şan, Mehmud Qizil û çend kesên din hunermedên salên jiyana Kurda ya reş bûn ku her yekî di demekê da perdên reş ên tunekirinê dirandin û bûn serkêşên doza siyasî-civakîya gelê Kurd. Rolê ku Necmedîn Xûlamî, Nasir Rezazî, Cemal Mofî û çend hunermedên din li salên 1970an li rojhelatê Kurdistanê ji bo şiyarkirina gelê Kurd dilîstin, hunermedên navbirî jî li bakurê Kurdistanê eynen karekî wiha dikirin. Hineka li ser rêbaza Kurdîniyê canê xwe fidakirin, hinek ketin zindana û şikenceyên giran dîtin û hinek jî neçar ji Kurdistanê derketin, lê bi stran û hunera xwe rêya xwe ya şoreşgerî berdewam kirin.



Şiyar Farqînî mirovekî Kurdpewer bû û em van bîr û ramanên wî di stranên wî da jî dibînin. Mesela li cem Şiyar dema dibêje: „şîrîna min“, şîrîna wî hemen Kurdistanê wî ya bindeste, lê aşiqên hingî nedikarin navê meşoqên xwe bi eşkerahî beyan biken.


Elbete berhemên wiha xweş zû li her dera Kurdistanê mezin belav bûn û li rojhelatê Kurdistanê gehişt destê me jî.

Ez bawerim sala 1990an bû, rojekê birayê min Kemal kaseteke Şiyar Farqînî bixwe ra ji Şemzîna anîbû

û bi hezeke mezin behsa deng û naveroka stranên wî dikir. Dema me jî guhdar kir, êdî bawer

biken belkî salekê zêdetir ew kasê ji teypa me nehate derxistin. Me tim guhdar dikir. Sedem jî ew bû ku hem peyamên siyasî têda hebûn û hem jî dengê Şiyar, dengî muxatebî rih û hasten me bû.

Sala 1999an ew hate Med TV û min ew ji nêzve dît. Mirovekî hêja, mutewazî, giran û li ser hunera Kurdî jî xwedî agahiyên baş bû. Hingî elbete ji sazî û hunermendên Kurd rexne jî dikirin û ji êşa piştî xwe jî hinek nerihet bû, lê tim bi hesret bû ku karên bikêrhatî ji muzîk û hunera Kurdî ra bike. Hîvîyên wî bi paşerojê pir zêde bûn. Lê heyf êşa giran derfet nedayê. Êşa kanserê ji wan salên zindan û şikenceyên giran gehîştê ku di girtîgehên Amed û Farqînê da li wî hatibûn kirin.



Ez niha li ser dixebitim ku bernameke document li ser jiyana û hunera nemir Şiyar Farqînî durist bikem. Hîvîdarim di karekî wiha da biser bikevim.

Elbete kesên weke Şiyar qet namirin, dengê wan heta bimîne, ew jî di nava dilê me dayê bijî.